

Şopgerênî!

Gengaze ku mirov Şopgeran rojên şemî li daristanan, gundan an jî, li nav bajaran bibîne û binase. Şopger bi qutîk û krawatên xwe bi awayekî hêsan tên nasîn. Lê ew ne çi dikin bi çi re mijûl in. Ji aliyê pir kesan ve nayê zanîn. Agir vêxistin, Kon vekirin û di bin baranê de li derva bûyîn pirî caran pêwendiya xwe bi wate û mane şopgeriyê ve girêdayî ye. Helbet mirov nikare tenê şopgeran bi van çalakiyan tarîf bike. Ji bo wan ew wate û maneke din dide û bi hev re bûyîn û di eynî derecê de girtina berpirsiyari yê ser milên xwe û jiyîna hîsên hevaltî yê.

kurdisch

TEVGERA ŞOPGERÎ.

Şopgerî ji bo zarok û ciwanên ku temenê xwe hatiye wexta dibistanê re tê kirin. Şopgerî li hemû welatan û di nava hemû gelan de ji bo keçik û lawikanre vekiriye. Ji aliyê Olî û Polîtîkî ve bêalî ye. (bêteref e) Tevgera şopgerî ji bo zarok û ciwanên hevsalî re bibe destek,wekî çar koman ji hev hatiye veqetandin. Tevgera şopgerî ji komeke tevlî hev, ji komeke keçik û komeke lawikan pêk tê ye. Ji bo ku çalakiyên curbecur pêk bên her dem ji endamên komên hevsal re, huner û pêwîstiya zarokan bi awayekî rêkûpêk tê berçav kirin. Şopgerî ji bo jiyana ciwanan û ji bo lêgerîna armanc û maneya jiyanê ji wan re di vî warî de dibe alîkar. Mirovên ciwan di hemû pêngavên şopgerî yê de di nava komê de bi hev re, bi awayekî çalak hînî rol û berpirsiyari ye xwe dibin. Ciwan ciwanan birêvedibin, bi awayekî zû fêrî erk û karên birêvebirî yê cûda cûda dibin. Ji bo birêvebiran ew hemû çar pêngav digel bûyîne mijûleke mezin, ew baweriya malbat û zarokan li hember wan bi awayekî pir cîdî digirin. Birêvebir her dem hewl didin ku ji zarok û ciwanan re bi rewş û hareketên xwe bibin mînak. Mamoste û şaxisên ku pêre ne bi serê xwe tevnegerin. Ew mamoste û şaxis tabî kontrole ku ji aliyê birêvebirên karzanî û bi hevkariya malbatan ve tên kontrol kirin. Ji bo ku ew ne jî, birêvebirî yê re amade bin her dem Kurs tên lidarxistin.

ÇALAKÎYÊN ŞOPGERÎ YÊN LI GORÎ HEVSALÊN HEV.

Çalakiyên şopgeran bi taybetî şemî paşnîvro tên meydanê û ji bo vê yekê jî, zarok li rawestgehên Otobus, Tramwayên ku nêzîkî hawirdora wan in û bi şertê ku mamoste li ba wan e hev û din dibînin an jî, tên cem hev. Zarok û ciwan bi awayekî rêkûpêk bi mamoste xwe ve dawiya heftê diçin Klûbeke nêzîkî hawirdora xwe û li vê derê şeva xwe derbaz dikin (dibihurînin). Ew rewş taybetî ji bo zarokên ku heta niha şev û wexta xwe li ti derên biyanî derbaz nekirî re dibe tecrûbeke baş û mezin. Jê pê ve ji bo tetîl û betlaneke du hefteyan ye, bihar û payîzê herin Klûbeke çiyan. Koma Mêşa hingiv û Gur vê tetîl û betlanê bi hev re di Klûbekê de dibihurînin. Şopger jî, di Konan de şeva xwe derbasdikin. Ew çalakiyên Tevgera şopgerî yê merhale salê herî bilind îfade dike.

ARMANC.

Tevgera şopgerî ya zarokan, ciwanan û mirovên têgihîştî herkesî weke hev dibîne û destek dike. Ew Tevger ji bo baweriya endaman, xwenasî û ji bo rexneyên şaxisî re dibe alîkar. Zarok û ciwan ji bo pêwîstiya laşû hîsên bedenî li gorî derfet û îmkanên xwe hînî sînor û nasîna xwe dibin. Ya herî mûhîm têkilî yên me bi mirovên ku em pê re dijîn û ji wan re vekirî bin û xwe gihandina mirovên ku li dervayî me ne û li beremberî van têgihîştî bin. Zarok û ciwan bi Tevgera şopgerî yên cîhanê, Spehî û sirên cîhanê veşarî û bi xweza û hawirdora xwe re fêrî çawa bên, jiyînê dibin.

KURTEÇÎROK, BÛYER Û HEJMAR WÊ.

Tevgera şopgerî di sale 1907 an de ji aliyê Lord Baden Powel û jina wî ve li Îngîstanê hate damizrandin. Armanca wan ji bo xebatên lêhatî yên ciwanan re jiyaneke baş a bi hev re û pêkanîneke tecrûbe û sêrpêhatiyên ciwanan re bibe alîkar. Dûrûnêzîk li tevayî cîhanê hejmara şopgerên jin û mêr 25 mîlyon in.

Di hundirê vê Tevgera şopgerî ya cîhanî de Tevgera şopgerî ya Swisrê bi navê (Pfadibewegung Schweiz PBS) cîh girtiye. Bi 51'200 endaman em komele herî mezin a ciwanên yen Swisrê ne. Di nav Tevgera şopgerî ya Swisrê de şaxên Kantonan hene. Tevgera «Pfadi Kanton Bern» jî, yek ji wan e. «Pfadi Kanton Bern» di nav xwe de çalakiyên xwe didomîne û ji komên bingehîn yên cûda cûda pêktên. Ew komên bingehîn roja şemî paşnîvro şunda ji çalakî û jî, qonax danînê berpirsiyar in.

MESREF.

Mesref û lêdanên ku di salekê de ji bo şopgerî yê tên kirin. Dûrûnêzîk (têxmînî) di navbera (SFR) 50 û 100 Franqî de ye. Ji pê ve hinek çalakiyên taybetî (wekî mînak ji bo serlêdan û ziyaret kirina baxçeyên heywanan) yan jî, ji bo kirina qutîk û çentê sirtê re pare aborî û madî.

pfadi kanton bern
PAKOB

Sekretariat Pfadi Kanton Bern
Speichergasse 31
3011 Bern

Tel: 031/311 57 64
www.pfadibern.ch
sekretariat@pfadibern.ch

BIENLI/WÖLFLI. Pêngava yeke-mîn: Li gorî zarokên 7-11 salî re.

Şemî paşnîvro şunda li Kampan bi lîstîkan zarok fêrî hawirdora xwe dibin û ji bilî vê zarok bi çîrokên curbecur (Mînak Pipi Langstrumpf, Dschungelbuch û Sihirbaz) derfeta jiyîna cîhana xwe ya fantazî dibînin û pêktînin. Bi hev re Rêwîtî kirin, Lîstîk lîstin, Govend girtin, Wêne çêkirin, xwe aramkirin û bi mûzîkê re mijûl bûyîn, ew ne hemû çalakiyên şemî paşnîvro şunda herî bingehîn ên mûhîm in.

PFADI. Pêngava duyemîn: Li gorî zarok û ciwanên 11-15 salî re.

Zarok û ciwan wekî beşdar, çalakiyên komê tespît û diyar dikin. Serpêhatî û macera xwe yên ku ji bîrnabin dijîn. Di nav komên biçûk de her endam zû ve berpirsiyariyekê hildigire ser milê xwe an jî, di warekî de dikare bibe berpirsiyar. Çalakiyên Tevgera şopgerî yê her dem di çarçewaya mijarekê de pêktên (Mînak: Çermsor Îndiyaner, Qorsanî an jî, Rêwîtiya Cîhanê). Dûmayîka ji karê dest hetanî şanoyê, ji teknîka rêçajotinê hetanî Lîstîkê, ji Lîstikan hetanî Sporê ragihandina jiyaneke bi aram û zanî bi hev re jiyîn û pêkbînin.



PIONIERS. Pêngava sêyemîn: Li gorî ciwanên ku 15-18 salî re.

Hîsên jiyaneke bi hev re bûyîn tim di plana pêşde cîh digire û pê hîsîna jiyaneke bi hev re dawiya lêkolîn û plan kirine çalakiyên ku ji aliyê komê ve hatina kirin in. Nîşana pêngava sêyemîn a herî mûhîm ewe. Êdî birêvebir bername û programê diyar nakin, tenê vê Kordîne dikin. Eger çalakiyên bername û programê hinekî berfirehtir bibe pêkanîna van çalakiyan ji bo şemî paşnîvro re dijwar û zortir dibe. Wekî mînak derketina meşa hefteyekî, çûyîna welatekî din an jî, kirina tureke bisîkletekê.

ROVER. Pêngava çaremîn: Ji bo ciwanên ku 18 salî mezintir re.

Pêngava çaremîn ji me re, organîze kirina komê di nav xwe de û bi endamên komê re û digel komên din ên ciwan re di derheqê jiyan kirina fikirên xwe de derfet û îmkanan pêşkêşî dikin. Ji bilî vê şahî û şadîkirin jî, nayên îxmalkirin. Hewcedarî bi hinek çalakiyên taybetî yên civakî hene. Yan jî gengaz û mimkîne ku ew çalakî bibin xwedî karakterekî nav-netewî.

Gestaltung: Sebastian Michel, Bern